# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (320):

## Şahiyaneke fere bi Cejna Newrozê, dijyatiyin li ser sivîlina, binpêkirinên "Ebo Emşe" û "Ebo Kesar", veşartiyên zorane, vêrgî û dizîn û dijatiyin li ser herdu Bajarokên Reco û Be'idîna, qutkirina darên zeytûnê

Kurdan li Efrînê bi boneya Cejna Newrozê ya îsal bi rengekî fere şabûn, agir dadan û li gund û bajarokên têvel li êvara 20 Avdarê şahî li dar xistin, û li roja din derketin xwezayê û tevlî navendên şahiya bûn, û bi wê rengî tekezî kirin ku viyana wan nayê şikandin û daxwaza Aştiyê, Azadiyê û Wekheviyê kirin; Û ew jî piştî barkirina rijîma jinavçûyî û hatina bayê azadiyên giştî, bi ser wê de jî heyama aramiyê bi awakî rêjeyî  yên ku "Amûra Asayêşa Giştî" ya girêdayî "Destlatên Sûriyê Yên Nû" li ser peydakirina wê kar kiriye; Û ji bilî hin dijatiyên li sivîlan û avêtina hin gef û gotinên derveyî tore û sincê li beramberî şahînêran tu tiştî sayîbûna cejnê neherimand!

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Dijatiya li ser sivîlan:**

- Li êvara 20.03.2025an. Z, li ser riya vegerê ji şahiya Cejna Newrozê bi hinek din ji merivên xwe re, li Taxa Eşrefiyê, li Kolana "El'melahî" li Bajarê Efrînê, bo mala xwe, Hemwelatî "**Hesen Sîdo** /45/sal" ji xelkê Gundê "Bircebdalo" ji aliyê çekdarekî ji anîndeyan ve -tevî çekdarekî din li ser matoreke duteker bû- bi qurşîneke kilaşinkovê hate armanckirin û di encamê de lingê wî birîndar bû, piştî ku "Sîdo" ji wan re got çima hûn Ala Kurdî ji dest Xortê ku al hildigirt dikişînin, û ji ber birîna wî ew ji bo dermankirinê guhestin nexweşxanakê, û paşê jî herdu çekdar reviyan.




- Û herweha li dema şabûna Kurdan bi hatina Cejna Newrozê, li Êvara 20.03.2025an. Z, li Kolana "Maratê" - Bajarê Efrínê, hin çekdar û xortan ji anîndeyan kevir avêtin makînên wan ú hewil dan ku Alên Kurdî yên ku radikirin bidirînin, tevî avêtina gotinên kirêt û sixêfan.

- Û di heman êvarê de jî, "Hazêm Mer'î/Ebo Umer" serkêşê Milîseya "Tîpa/Firqit El'hemzat" li Navça Reco -yê ku li Gundê "Hecxelîl" rûniştî- rabû bi avêtina qurşînan gef dan xelkê gund, û daxwaza baykotkirina şahiya Newrozê kir, bê ku kanibe cîbicî bike, çimkî xelk li ser bidawîkirina şahiyên xwe rijd bûn.



- Li 23.03.2025an. Z, piştî ku "Amêr El'reye" rêvebirê dibistanê (yê ji Bajaroka "Me'erit Herme - Idlibê) Alên Kurdî yên qumaşî di stûyên hejmarek xwendekaran de -li dibistana keçikan li Bajaroka Reco/Taxa Zinaran- dîtin, rabû ew ji stiwên keçikan qopirandin û gotinên kirêt jê re gotin û kêmrûmet kirin, û Istîxbaratên Turkiyê û Milîseya "Asayêşa Sivîlî" bi bûyerê agahdar kirin, û herdu aliyan jî rabûn Hemwelatî "Elî Hec Oso" -xwediyê Dîkana "Elûş" ya diyarî, fodilî/êksiswaran û firotina Alên Kurdî- girtin û kêmrûmet kirin û mekin lêxistin, û di heman demê de jî berdan, piştî ku ew li ser dandina vêrgiyeke diravî neçar kirin; Bi ser ku firotina Alên Kurdî rêdankirî bû, û li cejnê gelek al jî hatin hildan.

**= Li Bajaroka "Şiyê":**

Li êvara 16.03.2025an. Z, wexta "**Mihemed El'casêm**/Ebo Emşe" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" û bêtirî deh endamên li ser matorên duloqî gihîştin Bajaroka "Şiyê/Meydana Kaniyê", rabûn bê sedem mekin li Hemwelatî "**Ehmed Silêman Şêxo** /30/sal" xistin, û di encamê de ew kete nivînan; Û herweha jî gef û sixêf avêtin, û soz dan ku ew herêmê bernadin. Û gerokek ji Amûra "Asayêşa Giştî" gihîşte bajarokê piştî ku têkildarî pê re hate kirin, û wê jî lêkolînek di bûyerê de çêkir, û piştî çûn dîsa jî Endamên "El'emşat" qurşîn bi jor ve avêtin, û ta niha dijkar serberdayî ne.




**= Girtinine bêsûcane:**

Nûçeyin hatin belavkirin, li ser basmîşkirina hepsekê li Bajaroka Çobanbegê/El'ra'î - Herêma Babê, ji aliyê giropeke çekdar e serçavgirtî ve, li şeva 21.03.2025an. Z, û hate gotin ku bi dehan girtî jê reviyan, di nav wan de bêtirî /20/Girtiyên Kurd ên ji navîna sala 2018an ve -wexta dagîrkirina Herêma Efrînê ji aliyê Artêşa Turkiyê û Milîseyên Sûrî yên bi ser ve- zorane veşartî hebûn, û me navê sisiyan ji wan (**Bekir Ebdîn Hebeş** /35/sal ji xelkê Bajaroka "Be'idîna" yê ji 23.09.2018an ve girtî, **Welat Teşî kurê Hesen** /40/sal ji xelkê Gundê "Ereba" û **Esmet Xelîl Kalo** /46/sal ji xelkê Gundê "Kurzêlê" yên ji Avrêla 2018an. Z ve girtî) tekez kirin. Were bîranîn jî ku hîn dora/500/girtî ji xelkê Efrîn ji dora heft salan ve di Hepsa Bajaroka Çobanbegê/El'ra'î ya navendî de zorane veşartî hene, bê têkildarî bi cîhana derve re yan pêşkêşkirin ji dadgehine dadmend re, û ew zîndan Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" û Istîxbaratên Turkiyê bi rêve dibin.

Xwediyên girtiyan ji Hikometa Şamê bi serokatiya "Ehmed El'şeri" daxwaz dikin ku zaroyên wan bi lez werin berdan, û hepsên di bin desteseriya Dagîrkeriya Turkiyê de -ji girtiyên ku bi tuhmetên siyasî hatine girtin- bêne sipîkirin, weke vekirina hepsên din li dema piroseyên roxandina rijîmê.

**= Li Navça Reco:**

- Ta niha nivîsgeha abortiyê ya Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" dest dîdine ser bi dehan dîkanên li navenda Bajaroka "Reco" û kirên wan ên mehane distîne, û dema valakirina malekê ji aliyê anîndeyên vedigerin herêmên xwe yên resen ve, ew destê xwe dîdine ser û radestî xwediyê wê nake, ta ku belgeya malmewdaniyê neyê berzkirin û vêrgiyeke diravî neyê ferzkirin.

- Hîn Milîseya "Lîwa'i El'şemal" ya li Navça "Reco" dest dîdine ser bi deha zeviyên zeytûna, û radestî xwediyan nake, bi ser ku beşek ji wan jí vegerîne gundên xwe.

- "Ehrar El'şerqiyê" û "Lîwa'i El'şemal" nîvî tibaba êzingên ku ji bûdekên darên zeytûna (ên zeviyên hemwelatiyên ku ne li wir û rêdankerên/wekîlê wan bi rêve dibin) zep dikin.

- Ta niha "Heyder Be'ac, Mihemed El'barqî/Ebo Heyat" bi navê "Tîpa/Firqê Nehan" dest dîdinin ser dîkanina li Bajaroka "Reco" û Gundê "Maseka" yê hevcîwar -bi ser ku vegerîne hêrêmên xwe jî- û li dawiya her heyvekê tên da ku kirên dîkanan werbigirin.




- Hîn jî Hemwelatiyên Kurd ên vegerîne cî û warê xwe li Navça "Reco", neçarin ku li biryargeha Milîseya "Asayêşa Sivîlî" vegerin, da ku lêkolîn ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê ve bi wan re were kirin, piştî ku ji aliyê keyan/muxtaran ve werin agahdarkirin, û hin ji wan bêsûcane têne girtin û vêrgiyine diravî jî didin.

**= Li Bajaroka "Be'idîna":**

Xelkê bajarokê ketiye rewşa tirs û hişyariyê piştî dubarebûna basmîşkirina malan û dizîna peran, zêrmêr, makînan û hertiştmiştên din ji aliyên çekdarine diz ve, nimûne: Li şeva 20.03.2025an. Z makînak pîkab "Porter" e Hemwelatî "**Rêzan Mihemed Reşkêlo**" hate dizîn, li Şeva Şemiyê 22.03.2025an. Z makînak pîkab din e Hemwelatî "**Ehmed Hesen Hebeş**" hate dizîn, û li êvara 16.03.2025an. Z jî çekdarina hewil dan ku mala Hemwelatî "**Welîd Mistefa Şe'iban**" basmîş bikin, lê piştî kombûna bi dehan hemwelatiyan li pêş malê nikanîn.

**= Li Gundê "Şerqiya" - Navça Bilbilê:**

Ta niha "Ebo Kesar - yê ji Gundewarê Idlibê" - serkêşekî Milîseyên "Firqit El'hemzat" û berpirsiyarê gund û derdorê- dest dîdine ser dora /50/hezar darên zeytûnê (malmewdanên koçberên zorane), û malan û zeviyên zeytûnan radestî malbatên vegerîne nake, ta ku vêrgiyine diravî li ser wan ferz neke, û ji sala 2018an. Z ve, vêla Koçber "**Mistefa Xilo/Malbata Weten**" li Gundê "Şerqiya" zep kiriye û têde rûniştiye.

**= Qutkirina darên zeytûnê:**

Li 22.03.2025an. Z, çekdarin ji anîndeyan rabûna dora /40/darî zeytûnê û temen /40/sal ên Hemwelatî "**Luqman Ebdela Hemdo**" ji xelkê Gundê "Elkê" - Navça Şera bi piçekî û jê dudu jî ji kokê ve qutkirin; Û weha jî qutkirina dora/15/daran ên Hemwelatî "Hîkmet Ebo Menan" ji heman gundî bi piçekî.


قطع ما يقارب أربعين شجرة زيتون عائدة للمواطن "لقمان عبد الله حمدو" في قرية "علكه"- شرّان

**Kêf û şabûna Xelkê Efrînê ya ku di Cejna Newrozê de xuya bûye tewaw nabe, ta ku Dagîrkeriya Turkiyê û milîseyên bi ser ve ji holê ranebin, û herêma wan venegere serweriya Sûriyê û rêvebirî û parêziya keç û lawên wê bi rengekî rast û rasteqîn.**

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

---------------------------

**Wêne:**

- Birîndar "Hesen Sîdo".
- Serkêşên milîseyan: "Hazêm Mer'î, Heyder Be'ac, Mihemed El'bariqî".
- "Ehmed Silêman Şêxo" yê ku dijayetî li ser hatiye kirin.
- Qutkirina darên zeytûnê yên "Luqman Ebid Ela Hemdo", ji perçevîdiyoke ku ragîhandêr "Ehmed El'berho" li ser rûpela xwe ya Fêsbokê belav kiriye.